

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 46

**HÊJE MÊJE
EMÊ NUHA ÇEND
ÇÎROK Û MESELÊN XWE
JI WE RE BÊJIN**

Kuîlk

**Hevalê delal,
Redaksiyona Kovara Kulîlk,
Berî gişî em ji Koma Redaksiyona Kulîlkê û te-
mamîyên kurdên Swêdê re selavê xwe yê germ
dişînin.**

**Ez Kurdekî Sovyetê me. Li Republîkana Qazaxis-
tanê dimînim. Di sala 1973- an de em kurdên
Qafqasê surgûnî Republîkana Qazaxistanê ki-
rin. Ez bi xwe 71 salî me. Min xwendina xwe ya
bilind di sala 1954- an de dest anî û 45 salan min
di mektebên Qazaxa, Urisa de ders da. Niha
pensiyon im.**

**10 zarokên min hene; 7 kur in û 3 qîz in. Gişta
xwendina bilind dest anînin. Di xebatên cûrcûre
de dixebitin. Gişzewicînin û zarên wan hene. Bûk
û zavên min giş kurmanc in.**

**Ez bi xwe li gundê Qewqeculaxê de dimînim.
Gundiyên wê tev kurmanc in. Gund 150 mal in.
Li gund dibistana deh sale heye. Mamoste tev
kurmanc in. Heftê du caran dersên kurmancî
didin.**

**Di sala 1984- an de, di kovara Kulîlkê hejmara
15- an de bi navê "Kurdistan" helbestek min
derket. Ji Eriwanê, Tîmûrê Xelîl ji we re şandibû.
Ez dixwazim bibim abonê kovara we. Ezê çawa
bibim abone, ji min re bişînin.**

Bi silavên germ

Mûsaê Temo

MÊRGA KÊ YE?

Berhevkar : Bavê Hêvî

Rojekê ji rojan, malbatek koçer bar dike û mihek xwe li şûna wara ji bîr dike. Mîh li wê derûdorê digere û nagera, keriyê malbata xwe nabîne. Ew riyekê dibîne û dikeve ser wê riyê. Piştî demekê li mêrgekê rast tê. Mîh biryara xwe dide, ku li wê mêrgê cîwar bibe. Piştî wextê wê tê, du berx ji mîhê re çêdibin. Mîh û berxên xwe bi kêfxweşî di nava wê mêrga xweş de diçêrin. Roj bi roj berxên wê mezin û qelew dibin.

Rojekê, mîh dibîne ku şerek ber bi wan tê. Gava şêr digihêje cem wan, ji mîhê dipirse:

- Ma hûn li vir çî dikin? Ji we heye, ku ev mêrg bêxwedî ye?

Mîhê ji şêr re got:

- Bi saya serê te em li vir in. Em dizanin tu mîrê heywana ye û ev mêrg jî di bin serdariya te de ye.

Kêfa şêr ji peyven mîhê re hat û got:

- Hûn dikarin bêtirs li vir biçêrin û bimînin.

Piştî çendakî, mîhê dît ku gurek ber bi wan tê. Tirs kete dilê mîhê. Lê wê piştî xwe bi şêr xurt



dikir. Bawer dikir ku ji tirsê şêr wê gur nevêrîbe dest wan bide. Gava gur hat cem wan, bi hêrs ji mîhê re got:

- Ma hûn li mêrga min çî dikin? We destûr ji kê xwestiye, ku hûn li vir dimînin?

Mîhê ji gur re got:

- Ev mêrg ne ya te ye. Mêrga Şêr e û me destûr ji wî girtiye.

Gur li dora xwe nerî ku tu şêr tune. Loma jî, bi hêrs ji mîhê re got:

- Ev mêrga min e. Ji bo ku hûn bê destûra min li mêrga min çêriyanin, ezê herdu berxên te bixwim. Çiqas mîh li ber gur geriya jî, gur herdu berxên wê xwar û jê re got:

- Ez careke din te li vê mêrgê nebînim. Eger tu li vir bimîne, ezê te jî bixwim.

Piştî demekê şêr dîsa di wê mêrgê re derbas dibe. Mîh dihere cem şêr û serpêhatiya xwe ji wî re dibe. Şêr gelekî aciz dibê û ji mîhê re dibê:

- Wer xuya ye, ku ew bêbexta wê dîsa were. Ezê xwe di paş vê qûçê de weşêrim. Gava gur hat û dîsa got, ku ev mêrg ya wî ye. Jê re bivê: "Eger mêrg ya te ye, sê gava nêzikî wê qûçê bibe û bi wê sîn bixwe."

Piştî kêlikê, gur dîsa hate wê mêrgê û ji mîhê re



got:

- Min ji te re ne gotibû, ku ez te dîsa li mêrga xwe nebînîm. Ji bo te bi ya min nekir, ezê vê carê jî te bixwim.

Mîhê ji gur re got:

- Ev mêrg ya şêr e. Eger tu dibê ya min e û rast e; sê gava nêzikê wê qûçê bibe û bi wê qûçê sûnd bixwe. Eger tu bi wê qûçê sûnd nexwe, ez ji te bawer nakim.


Gur, ji bo ku baweriya mîhê bi xwe bîne, berê xwe da qûçê çû. Lê gava ew nêzikê qûçê bû, çavên wî li çavên şêr ketin. Bi carekê qudûmê wî şikest û lingên vî lerizîn. Bi dengê melûlî got:

- Welleh xwedê heye. Ez nikarim bêbextiya bikim. Ev mêrg, mêrga şêr e.

Şêr ji pişt qûçê derket, ber bi gur hat û got:

- Hey bêbext û derewîno! Ma ji bo çî, gava te ew berxikên belengaz xwar, xwedê û bêbextî nehat bîra te?

Devê gur ketibû hev û ji tirsê diricivî. Bi wî halê xwe dixwast gunehê şêr bi xwe bîne. Lê şêr biryara xwe dabû. Lepek li serê gur xist û ew di cî de kuşt. Bi wî awayî, şêr tola herdu berxikan hilanî.



WELATÊ ME

Navê welatê me Kurdistan e. Welatê mirov, ew cihê ku bav û bapîrên me li jiyandin û lê dijîn. Ew cihê ku bi sedsalan ne, ku lê cîwar bûnin; awayî lê çekirinin û lê mirinin.

Bi hazaran sal in, ku pêşiyên me li ser axa Kurdistanê cîwar bûnin. Dem dema li vê derê, dewletên biçûk û yên mezin damezirandinin. Lê mixabin, em îro ne xwedî dewlet in. Li ser nexşa dinyê, navê dewleta me tune. Welatê me di bin destên dijminan de ye. Dewlemendiya Welatê me, ji alî wan dijminên xwînmij ve, tê talan kirin. Loma jî, welatê me zêde pêş ve nare û feqîrî lê heye. Lê di rastiya xwe de, welatê me pir zengîn e. Di warê petrol û madenan de pir dewlemend e. Heger dijminên me, ew zengîniya talan nekirinan, dê feqîrî ji li welatê me kêmba.

Dijmin naxwazin Kurdistan pêş ve here û dixwazin gelê me feqîr û jar bimînin. Gelek rûniştevên Kurdistanê ji bê çaretî ji Kurdistanê koç dikin; Ji bo karekî ji xwe re bibînin û aboriya zarokên xwe bikin diherin Tirkiyê û welatên din. Bê guman, bi wî awayî ew ji ziman û kultura xwe dûr dimînin. Hêdî hêdî be jî, tesîra ziman û kultura biyanî li ser wan çêdibe. Heger hewildanek taybetî nîşan nedin; di nava ziman û kulturên biyaniyan de dihilin û asîmle dibin.

Gelê me jî dixwaze wek her neteweyî serbixwe

bijîn. Ne di bin destên neyar û dijminan de be. Dewleta wî hebe. Ala Kurdî li ser baniyan pêl bide. Al, sembola welat û netewetiyê ye. Her mirovê bi rûmet ji welat û ala xwe hez dike. Ji ber dizane, ku al rûmet û namûsa wî/wê ye. Loma jî, gelek keç û lawên Kurd ji bo Ala wan jî li ser axa Kurdistanê pêl bide, xwe gorî kirinin. Îro jî bi milyonan law û keçên Kurdistanê ji bo wê armançê dixebitin. Amadenin xwe di wê riyê de, gorî bikin. Law û keçên kurdan jî, dixwazin wek yên neteweyên din serbest û azad bijîn. Li dibistanên xwe de bi zimanên xwe bixwînin. Stran û helbestên kurdî bê tirs û xof bibêjin. Lîstik û gofendên xwe bilîzin.

Dijminên me çiqasî har û hov bin jî; wê nikaribin pêşiya vê xebatê bigrin. Kurdîstan wê ji bin destan derkeve û rizgar bibe. Ala rengîn wê li ser çiya û baniyên Kurdistanê pêl bide. Zarokên Kurdan wê bi kêf û şayî herin dibistanên xwe. Kîz û xortên me wê dawêtan geştir bikin. Denbêj û hozanên Kurdan wê vîna welatperweriyê bilintir bikin. Em dê welatê xwe yê rind û şêrin ji nû de ava bikin û bighêjînin qonaxa welatên pêşdeçûyî. Hevî û baweriyên me yên di wî warî de, divê hergav geş û zînde be.

Mîrze

PIRS:

- 1) Navê weleta ku kurd lê dijîn çi ye?**
- 2) Kurdistan welatekî çawa ye?**
- 3) Ji bo çi feqîrê roj bi roj li Kurdistanê bêtir dibe?**
- 4) Di Ala Kurdî de, çend reng hene?**
- 5) Ji bo çi, gelek keç û lawên Kurd xwe gorî dikin?**

MANA VAN BÊJAN BI ZIMANÊ KU HÛN LI DIBI-STANÊ DIXWÎNIN BINIVÎSIN.

Welat	:
Al	:
Zengîn	:
Feqîr	:
Serdest	:
Bindest	:
Serbixwe	:
Gorî kirin	:
Pêl dan	:
Govend	:
Stran	:
Helbest	:
Dewlemend	:
Dengbêj	:



NÊÇÎRVAN Û KÛÇIKÊ WÎ

Rojekê, nêçîrvanek û kûçikê xwe diherin nêçîrê. Neçîrvan gelekî dimeşe û pir tî dibe. Dibîne, ku ji binê tahtekê dilopên avê tîn xwarê. Nêçîrvan zerika xwe datîne binê tahtê. Ji bo ku dilopên avê têkevin tasa wî. Lê her cara ku zerika wî tije av dibe, kûçikê wî xwe li zerikê dixê û ava ku di zerikê de dirjîne.

Sê caran ew zerik bi ava dilopan tije dibe. Lê her sê caran jî, kûçikê ava di zerikê de dirjîne. Nêçîrvan tê derdixê ku tiştê di vê meselê de heye. Ew derdikeve ser tahtê. Lê çî bibîne! Mahrekî reş li ser tahtê ye. Jahra xwe bera nava wê ava ser tahtê dide.

Nêçîrvan radibe wî marî dîkujê û dihere kûçikê xwe maçî dîkê.

Ji çîrokên dibistanê.


Mamoste Îsa Îdem

Qamîşlo

Mîtanî

Nêzikî 2.000 sal berî Zayîna Îsa, xelkên Hîndo-Ewropayî ji Qafkasan ve daketin herêma Kurdistanê îroyîn. Ji wan **Kasî** li herêma Zagrosê û Mîtanî jî, li rojavayê wan, li herêma Dicle û Torosê bi cîh bûn. Dema Kasî hatin herêma Zagrosê, li wir, ji berê ve **Gotî** û **Loloyî** jî hebûn. Li herêma Mîtaniyan jî **Hûrî**, **Nayrî** û **Sobarûyî** dijiyan. Ev demeke gelekî tarî ye. Heta îro jî binyata van gelan baş ne zelal û dîyar bûye. Lê, li gor tehmîna hinek dîrokan û arkeologan, dibe ku binyata Kurdan ji Mîtanî û Kasîyan be. Mîtanî û Kasî, di demekê bi şûn de, li ser gelê herêmê hukûm kirin. Zimanê xwe yê Hîndo-Ewroyî û sistema xwe ya civakî li ser gelên herêmê dan qebûl kirin.

Mîtaniyan tixûbên xwe fireh kirin. Ji rojhilat ve birin heta çiyayê Zagros û gola Wanê, ji rojava ve gehêst Derya Spî, ji bakur û başûr ve jî, ji Torosan heta axa Suriyê ya îroyîn berfireh kirin.



Kasî

Kasî jî Zagrosî ne. Kasî, B.Z. di salên 1700' î de, ji çiyayê Zagrosê berjêr daketin. Êrîşek birin ser Babilyoniyên û Babîlon kirin bin destê xwe. Bi navê Kodonîyaş dewletek ava kirin. Çen sal paşî, Senharîban êrîşê Kasîyan kirin û dewleta wan xirab kirin. Kasîyan xwe ji Babîlonê berjêr kişandin herêma Loristana îroyîn û li wir bi cîh bûn. Li herêmê bûn hêzekê mezin û tîkiliyên xwe bi dewleta Ahmîniyan ve baş kirin.

Îskenderê Mezin, B.Z. di sala 331'ê de, ber bi rojhilat ve hat. Bi Kasîyan re şerekî gelekî dijwar û mezin kir. Îskender, bajarê Hewlêrê girt û ber bi Îranê ve çû.

Kasîyan hebûna xwe ya bi rêxistinî heta sala 1. B.Z. domandin.

Di warê huner û pîşe de, Kasî gelekî pêşketî bûn.



Kevira Tixûb, Kasîyan B.z. di sala 1200 de , ji Babilyoniyên re çêkirine.

Bihizire û bersiv bide

(ji Ofroka Kurd û Kurdistanê)

- 1- Gelo kengê li Mezopotamyayê şaristaniyê dest pê kiriye?
- 2- Rola Kurdan di vî warî de çi ye?

VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHĪNIN HEV



ZÎREK Û RINDÊ

Berhevkar: M- Alî K.

Zîrek û Rindê xweng û birayê hev bûn û gelekî ji hevdû hez dikirin. Piştî diya wan dimre, bavê wan ji xwe re jineke din tîne. Kêfa jinbavê zêde ji wan re nedihat. Ev jî, zêdetirîn ji ber xizaniyê bû; ne karekî bavê wan hebû û ne jî perê wî hebû.

Rojekê jinbavê ji bavê wan re dibê:

- Tu dibîne, bê em di çi halî de ne. Em nema dikarin gepek nan ji xwe re peyda bikin. Ma em dê çawa van zarokan xwedî bikin! Ya baş ew e, ku em wan bibin li nav daristanê, li xewlecihekî berdî û bîn.

Pêşîn bavê wan gelekî hêrs bû, evaya qebûl nekir. Lê pişt re, hingî jinbavê jê re digot û dema ku tu çareyek ji xizaniya xwe re nedît, mecbûr ma ku bi ya wê bike.

Sibehê zû, jinbavê ji Zîrek û Rindê re got:

- Bi lez xwe girêbidin. Emê bi bavê we re biçin daristanê, êzinga bikin.

Kêfa Zîrek û Rindê pirr hat. Bêyî ku hayê wan ji tiştêkî hebe, kincê xwe li xwe kirin û dan dû bav û jinbava xwe. Dema ku gelakî bi nav daristanê de çûn, jinbavê ji Zîrek û Rindê re got:

- Hûn ji xwe re li vir bilîzîn. Ez û bavê we jî, emê herin li wî alî êzinga bibirin. Heta em vegerin, hûn bi derekê neçin ha!

Zîrek û Rindê gotin:



- Baş e, em li hêviya we ne.

Lê jinbav û bavê wan xwe ji wan vedizîn. Ew li wir hiştin û şûnde vegeriyan malê.

Heta ku roj çû ava, Zîrek û Rindê ji xwe re lîstik lîstin û li hêviya bav û jinbava xwe bûn. Lê wexta roj çû ava û dinya tarî bû Rindê gelekî tirsîya, bi destê Zîrek girt û ji re got:

- Were em biçin mal.

Gava Zîrek dengê wawîkan bihîst, gelekî tirsîya. Ji ber ku gelekî ji mal dûr ketibûn, riya malê jî nas nedikirin. Dinya jî bêtir şevreş dibû. Ji dêlva ku ber bi mal de biçin, bi aliyekî din de meşîn. Çûn, çûn, çûn gelekî bi nav daristanê de çûn. Hîgî bi rê ve çûn, gelekî westiyan. Gelekî jî birçî bûbûn. Ji bo ku bêhna xwe berdî hinekî sekinîn û li tariya dora xwe temaşe kirin. Dema ku şewqek ji dûranî diçirîsand dîtî, gelekî kêfa wan hat û rast xwe li şewqê girtin.

Wextê gihiştin cem şewqê, dîtî ku malek e. Lê, gava bi dizîka di pacê re li hundir nerîn, çi bibîne! Pîrek sêrdar, destarek li ber, şekir dihêre. Hundurê malê jî tijî benî, gwîz û bastêq e.

Zîrek û Rindê bi dizîka di derî re ketin hundir. Beyî ku pîra sêrdar pê bihisîne dawên xwe tijî şekir kirin û xwestin derkevin derve. Lê hingî Rindê dawa xwe dagirtibû, nema dikarîbû rabe. Wexta xwask ku ji hundir bazde, Rindê terpilî û ket. Zîrek bi şûnde vegeriya, da ku alîkariya wê bike. Lê wê çaxê jî, pîrê bi wan hisiya, hişk bi çeplên herduyan girt û ew zêft kirin. Pîra sêrdar



ji wan re got:

- Werin, werin merevin! Gelek xwarin û tîtîk li cem min hene. Ezê wan bidim we.

Lê mebesta pîrê tiştêkî din bû. Pîrê, Zîrek xiste kewarekê û devê wê qenc girt. Ji rindê re jî got:

- Ji îro pê ve, tu destirmana min e. Ji te re melkes û hundirê malê bimale.

Mebesta pîrê ew bû, ku wan baş qelew bike û dûre jî wan ji xwe re bibrêje û bixwe. Ji ber wê jî, gelek xwarin dida wan. Pîrê her heftê diçû ber qulika kewarê, destê xwe dirêjî hundir kewarê dikir û jî Zîrek re digot:

- Bexê min hela ka ez li tiliya te binerim, bê tu baş qelew bûye.

Lê Zîrek ji dêlva tiliya xwe, hergav teriya mişkekî ku di kewarê de girtibû, dida destê pîrê. Pîra sêrdar jî digot:


- Hîn tu baş qelew nebûye.

Lê rojekê dema ku pîrê xwest dîsa li tiliya Zîrek binere, Zîrek dît ku mişkê wî reviyaye. Ew mecbûr ma ku tiliya xwe bi destê wê de. Gava pîrê li tilya wî nerî, dît ku Zîrek baş qelew bûye. Tama devê xwe xweş kir û got:

- Rind e...Tu baş qelew bûye.

Pîrê berê xwe da hewşê, tenûr tijî êzing kir, tenûr dada û hêlanek li ser tenûrê çêkir. Pişt re, çû Zîrek ji kewarê derxist, ban Rindê jî kir û got:

- Werin ji xwe re hinekî li hewşê bilîzin îro. Binerin, min ji we re hêlanek jî çêkiriye. De werin ez we bihejînim.



Zîrek û Rindê mebesta pîrê fam kiribûn. Ji ber wê jî, herduyan ji wê re gotin:

- Em heta îro qet li hêlanê siwar nebûnin. Em nizanin bê meriv çawa lê siwar dibe. Eger tu şanî me bide...

Pîra sêrdar got:

- Ji ve hesantir çî heye.

Pîra sêrdar çû li hêlanê siwar bû. Zîrek û Rindê ew çen caran hejandin. Dû re, herduyan bi hemû hêza xwe pîrê dahf dan û ew ji hêlanê werkirin. Pîrê li hewa qulopazî bû û bi serî ve kete hundirê tenûra sorbûyî. Rindê bi lez çû qapaxa tenûre anî û danî ser devê wê. Zîrek jî çû keviyek anî danî ser qapaxê. Pîra sêrdar di tenûrê de şewitî û bû xwelî. Mala wê jî, tev bi Zîrek û Rindê ma.

Lê Zîrek û Rindê gelekî bêriya malê kiribûn. Rabûn, du tûrik ji xwarinê û zêr û zîvê pîra sêrdar dagirtin û bi rê ketin.

Bavê wan jî, gelekî poşman bûbû, ku zarokên xwe li nava daristanê berdabûn. Ew jî derketibû nava daristanê û li wan digeriya. Piştî demekê Zîrek û Rindê pêrgî bavê xwe hatin. Hevdû himêz kirin û dûre jî tûrikên xwe yên ku ji zer û zîvên pîrê tijî kiribûn, şanî bavê xwe dan. Kêfa bavê wan zêdetir hat û bi kirinên zarokên xwe gelekî serbilind bû.

Dema gihiştin malê, jinbava xwe jî himbêz kirin, ji ber ku ew jî poşman bûbû.

Heta taliya temenê xwe, ew di kêf û xweşiyê de jiyan.

QUNCIKA MATEMATÎKÊ

1) Şeş heval bi hevdu re diherin Aşxanê. Bi hemûyan 130.- kronên wan hene. Dixwazin Pîza bixwin. Ji xwediyê aşxanê dipirsin, bê ji bo şeş kesan çiqas pere divê bidin. Xwediyê aşxanê ji wan re dibê, ku divê ew 150.- kronan bidin.

a) Gelo her pîzak bi çend krona ye?

b) Ji bo şeş pîzan bikin, çend kron ji wan re pêwîst in?

2) Şêrgo li aşxanakê dixebite. Rojên 10 seetan kar dike. Seeta wî bi 35.- kronan e.

a) Şêrgo rojê çend kronan kar dike?

b) Di heftakê de çend kronan kar dike?

3) Rojbûna dildare. Xweha Dildar dixwaze jê re diyariyekê bikire. Dihere dikanekê û li nava lîstikên zarokan digere, ku tiştêkî ji Dildare biecibîne. Hespikêkî pir xweşik dibîne. Bihayê hespik 250.- kron e. Lîstikek din heye ku bihayê wê 75.- kron e. Birayê Dildar jî 100.- kronan dide xweha xwe ku diyariyekê li ser navê wî jî bikire. Ji dervî wan herdu tiştan xweha Dildar lîstikek din jî dikire û ji bo hemû tiştan divê 345.- kronan bide.

a) Divê xweha Dildar çend krona di ser perê birê xwe xîne?

b) Listika sisiyan bihayê wê çiqas e?

PÊZANÎN

1)

Tiştêkî min heye tiştanî
Ber kevirê xiştanî
Ne pê ye, ne panî
Ew çi ye?

Bersîv:

2)


Tiştêkî min heye
Dikşe, ne mar e
Dimike, ne kar e
Pişt kovike sîng dar e
Ew çi ye?

Bersîv:





3)

Tiştêkî min heye
Canê wî gotş e
Kincê wî derzî
Ew çi ye?

Bersîv:



XAÇEPIRS



BERSÎVA PÊZANÎNA

1) Her her dîwar,
Mermer dîwar,
Her odekê yeke kubar.
Ew çi ye?
Bersîv: LAMPE

2) Mûyê du karika,
Avêtine ser du darika.
Ew çi ye?
Bersîv: KON


3) Xal û xwarzî,
Metik û birazî,
Hevkirine gazî.
Ew çi ye?
Bersîv: BERDÊLÎ


4) Deva gurî,
Bişkul firî.
Ew çi ye?
Bersîv: TIFING


BERSİVA XAÇEPIRSAN


1


	K				
2	M	E	L	Ê	V
	L				
	B				
3	K	E	F	I	K
	T				
	A				
				5	
4	R	I	N	D	E
				Ê	
				G	
				E	

1 

2 

3 


4 

5 

**KEREKÎ ME HEBÛ
Û KUNDIREKÎ ME
KERÊ ME
KUNDIRÊ ME KOT KOT

ME JÎ ÇÎROK
Û MESELÊN XWE
YÊN VÊ HEJMARÊ
JI WE RE GOT**

Kulîlk



www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPANGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 15:- skr
BIHA